# Derfetên dubarebûna diyaloga kurdî

»»» R:8




# Mistefa Hicrî: Hêza serkutker bibe hinceta “tevahî” û “yekîtiyê”

»»» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (442) 20-03-2023Buha (1000) Tûmen*

# Bîranîna panaromaya şoreşa Jînayê

»»» R:3

# Erê gelo gelên Tirkiyê dê bikarin Gandiyekî bi Afirînin

»»» R:4

# Koça dawiya Ewropiyekê li welatê Kurdan

**Navenda Birêveberiya PDKÎ bi sedema koça dawiya rêzdar “Nesrîn Qasimlo” daxuyaniyek belav kir**

**Deqa daxuyaniyê wiha ye:**

Em bi dax û keserê ve radigehînin ku rêzdar “Hêlên Krolîş” naskirî bi “Nesrîn Qasimlo”, hevjîn, heval û hevbîra Dr. Qasimlo, Sekreterê berê yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê û rêberê bi nav û deng yê tevgera Kurd li Kurdistana Îranê û xebatkarê naskirî yê azadî û demokrasiyê, êvareya roja Înê 10ê Adara 2023an (19ê Reşemeya 1401an a Rojî), bi sedema bi temenî û nexweşiyê di temenê 89 saliyê de li bajarê Parîsa Feransayê koça dawiyê kir.

Em bi vê hilkefta bi xem, tevî vê ku bi sedema koça dawiya wê kesayetiya rêzdar xembar bûn, em sersaxiyê dibêjine Rêberiya Hizba Demokratê û hemû kesûkar, xizm û dostên rêzdar Nesrînê û tev têkoşerên Demokrat û civaka dilşewitî û emegnasên xelkê Kurdistanê û em xema jidestçûna “Nesrîn xan”ê bi xema hemû aliyekê dizanin.



Rêzdar “Nesrîn Qasimlo” li sala 1312an a Rojî, li bajarê “Prag”a paytexta “Çêkûslovaki”ya berê ji dayîk bibû û xwendina xwe ya zanîngehê di vî bajarî de dest pê kiribû û her di serdemê xwendinê de digel rêberê nemir “Dr. Qasimlo” hevnas bûn, ku Dr. Qasimlo jî wê demê li vê zanîngehê di salên dawiya desrxwandina de bû; Paşê wê hevnaskirinê, li sala 1952an (1331 a Rojî), wan jiyana hevpar pêk anîn û rêzdar “Nesrîn Qasimlo” ji vê demê ve heta dawiya jiyana xwe digel Kurd, xebat û tevgera rewa ya wê jiya û hêviya azadî û gihîştina Kurd bi mafê netewayetî koça dawiyê kir û di rastiyê de qedera xwe digel qeder û xebata Kurd girêda.

Emegnasiya rêzdar “Nesrîn Qasimlo” bi rêbaz û Hizba Dr. Qasimlo re ku Hizba Demokrat di hemû salên piştî şehîdbûna “Dr. Qasimlo” jî berdewam û berçavc bû, ti carî çi li jiyan û çi li derbaskirina rojane ya jiyana xwe de û çi li bîrûbawera xwe ya demokratane de li Hizba “Dr. Qasimlo” mewda negirt û Hizba Demokrat jî, ew ji bîr nekir; Nesrîn xanim tevî Dr. Qasimlo hemû ew pirsgirêkên jiyana nihênî li bajarê Tehranê û avarebûn li Îraqê û piştre li Ewropayê bi dil vergirt û di vebîranînên xwe de li pirtîka “Ewropayiyek di welatê Kurdan de”, jan û azarên jiyana xwe bas kiriye.

Berhema jiyana rêzdar “Nesrîn Qasimlo” digel “Dr. Qasimlo”, du keçên bi navên “Mîna û Hîwa”yê ye, ku wan jî bi sedema erkê xebatkariya “Dr. Qasimlo” gelek bi kêmî bavê xwe didîtin. Mana heyam bi heyam a “Nesrîn”ê li çiya û hebûna wê li rex Dr. Qasimlo û nasîna pêşmerge û jiyana şoreşgerane ya wan ji nêzîk ve, hem Nesrîn xanim di dilê pêşmerge û têkoşerên Demokrat de cih girt û hem têkoşerên Demokrat û xelkê Kurdistanê û hêviyên wê netewê dil, hizir û mêjiyê “Nesrîn”ê bo hertimî zindî ragirtibû.

Em careke din û bi navê Rêberatiya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, hevxemiya xwe bo jidestdana rêzdar “Nesrîn”ê didin xuya û yad, nav û zehmetên wê bo hertimî di bîr û yada xwe de dihêlin.

Riha wê şad û bi hêviya bidestvehatina xweziyên wê

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêveberî**

**20`ê Reşemeya 1401`an a Rojî**

**(11`ê Adara 2023`an)**

# Mistefa Hicrî: Hêza serkutker bibe hinceta “tevahî” û “yekîtiyê”

**Mistefa Hicrî:Em dixwazin krameta mirov, qebûlkirina nasnamseya cuda û avakirina civakeke azad li serweyî**

**Hêza serkutker bi hinceta “tevahî” û “yekîtiyê” be.**

**(Peyama Mistefa Hicrî), Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizbê)**

**Hevwelatiyên hêja!**

**Kurdistaniyên berxuder!**

Di demekê de ber bi Newrozê diçin ku neteweya Kurd bi hêviya zêdetir li demên berê vê hilkeftê bike bi hewêna berxwedanî yekîtî û yekrêziya nîştimanî. Di heman demê de ber bi pêşwaziya hilkeftekê diçin ku bo beşek ji neteweyên din di vê navçeyê de watedar e û çavkaniya vejînê ye. Lê, ya ku cihê hizrkirinê ye, Newroza Kurdevarî ji yên din cuda dike, wateya mijara vê hilkeftê ye, ku cudahiya ber çavan li Kurdistanê de he ye. Newroz bo neteweya Kurd bi wateya rabûn û serhildan li hember zilm û serdestiyê tê, wateyek ku dikare di îroya Îranê de jî watedar be.
Di dîtingeha neteweyên serdest de, bitaybet ev welatên ku Kurdistan bi ser wan de hatiye parvekirin, Newroz tenê hilkefteke ku li hundr de xweza reng diguhere û sîmayeke nû bixwe digire. Anîna rojveya “Nasname”yê dibe mebest û rihek tijî li î dide bi vê hilkeftê. Xuya ye ku ev riha tijî li rabûn û berxwedanî taybet nine bi îro, belkû di vê serdemê de hatiye gorê ku Kurd weke netewe hest bi bindestî û bêmaf bûnê kiriye û xema azadiyê hebûye. Di qonaxa “tevgera Jîna”yê de, zêdetir ji demên berê civaka Kurdistanê tevlî wateya rizgarîxwazaneya Newrozê bûye û ev hilkefta nîştimanî jî dikare gur û coşeke nû bide bi tevgerê.

Yaku weke nasname cem civak û tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê cihgîr bûye, ku heqîqeta vê bas dike ev zêdeyî sedsalan e ku Kurdistan li hember bi zêdxwaziyê xebatê dike.
Ji aliyekê din ve jî, hewl daye bo derbaskirina rewşa bindestî û derbasbûna ber bi qonaxa rizgariyê, ji aliyek din ve jî dijberî û rikeberî digel zêdexwaziyê, bûye parek ji nasnameya Kurdistanî bûn û rêbaza tevgera neteweyî. Herçend ku mafê destnîşankirina çarenivîsê bo gihîştin bi serweriya siyasî, mafeke bingehîn a gelan e û bername û dirûşima siyasî weke forma dabînkirina vî mafî girêdayî rewş û mercên siyasî ye, lê cîhanbîniya mirovê Kurdistanê kûrahiya stratîjiyeke xwe di êxisîrbûna yên din de nabîne. Berevajî serweriya siyasiya neteweyên din jî, weke bingeh wergirtiye û weke forma baweriyê pê ye.

Bi wateyek din, tevgera neteweya demokratîk a Kurdistanê, bexteweriya xwe di bindestî, qiraxhavêtin û înkarkirina nasnameyên din de nabîne, li ser “krameta mirov” pêdagîr e, çi wek tak û çi wek netewe vedike.

Ev têgihîştina, hilgirê gotar û koma wan nirxan e ku, nasnameya Kurdistanê pêve bejin giritiye, pêdagîriya Kurdistaniyan li ser paşerojeke azad tenê daxwazeke siyasî nine, belkû armanceke li hundrî zêdexwaziyê di hemû curekê de çi li Kurdistan û çi li Îranê de red dike.

Ev rêbaza vê yekê tîne bîra me ku yekrêzî û lihevkirina nav mala Kurd esasa bingehîn bo gihîştin bi armanca dîrokî ya pir binirx a azadiyê ye. Her ji ber vê yekê ye hevxebatî digel neteweyên bindestyên di nav cografiya Îranê de jî, weke pirensîpeke neguhera siyasî dziane û hevxebatî û hevçarenivîs bûna neteweyên bindest li hember hişmendiya zêdexwaz û navendgera de bi her awayî be, xala yek alîkirinê ye.

Aliyê kêm di heyama sedsala borî de, ya ku Îran girêdayî xwe kiriye, hebûna bawerî bi sîstem û paşayetî û îslama siyasî bûye. Encama derkevtina her du coran li hizrkirina înkara nasnameya xery fars bûye û her di vê rê de, formên çewsandinê hatine berhem anîn, lewma derbasbûn li siyaseta tepeserker ya her du îdolojiyê gelek sanahî û sade nine. Ya ku Kurdistan bona derbasbûna hertimî ji vê rewşê weke çaresereke mirovî û demokratîk pêşniyar û pêdagîriyê li ser dike, bihevrebûna dilxwazane ye di Îraneke federal û silkolar de.
Siyasetên dewlet neteweyên Îranê di berê û îro de armancên vê xuya ne: Zilm, newekhevî, asîmîlasyon, havêtina qiraxê, îdam, teror, îşkence liserhev curên zilmkirinê bûne ku, çareserkirina wan hewce ye bi derbasbûn ji hişmendiya berê û ya niha ya navendê.

Ya ku niha bûye heqîqet, qebûlkirina nasnameyên di nav çarçêveya cogirafiya îranê de ye, ku dixwazin xala dawî li ser dubare bûna pêşerojê danên, jê derbas bin, ev yeka jî demekê tê gorê ku, xwe sepandin û înkarkirinê, ber bi bihevre jiyaneke hêvîdar pêngavan havêjin, bihevrebûnek ku hemû di yek astî de bin û her nasnameyek ku hilgirê taybetmendiyên xwe be. Wate, hişmendiya navend \ hişmendiya havêtina qiraxê nemîne û serweriya yek aliya pêkhatiyekê li “navendê” hiloşe û curek serweriya hevpar û zelqandina mafê wekhev bo hemû neteweyan di destûra bingehîn de bê misoger kirin.
Tevgera “Jin, Jiyan, Azadî” agireke wisa xistiye cerg de, ku êdî tiştek din pirsa rizgariya jinê nabe bê înkar kirin. Civaka Kurdistanê nîşan da ku li Îranê pêşenga xebata li dijî paşveroyê ye û li rêya nirxên bilind yên vê tevgerê dixwaze pêngaveke girîng bo qutkirina zilma neteweyî, qad, zayendî hiligire.

Di vê tevgerê de dubare Kurdistan bûye çepera berxwedanî ji nirxên mirovan û zêdetir li demên berê pêdagîrî li ser vê mijara girîng kiriye ku bo avabûna civakeke wekhev dibe beraxwe bidin bi hemû curên tepeserkirin û cudahîdanînê.
Cewhera tevgera “Jin, Ji-



yan, Azadî” bêguman afirandina têgihîştineke nû ye. Têgihîştinek ku li dijî hizra faşîstî, xeyala olî û nasnameya yek rehendî ye û li hundr de cudahiyên di nav civakê de bilind dinirxîne. Pêşengayetiya jinên Kurd girîngî dan bi pirsa jinê di Kurdistan de bûye çavkanyieke bihêz bo tevgera neteweyî demokratîk a Kurd di vê rêyê de, cîhaniyan dîtin ku neteweya Kurd xwediyê îdareyeke bihêz e, bona avakirina civakekê ku li hundr de gihîştin bi îdaleta civakî, pirsa sereke be.

Newroa îsal berevajî newroza sala 1358`an ku Kurdistan bi tena serê xwe li hember zêdexwaziyên li Îranê di meydanê de bûye, niha piraniya xelkê navçe û herêmên neteweyî, di rikeberî û berxwdanî li dijî Komara Îslamiya Îranê de ne. lewma, çeperek mezin bi berfirehiya cogirafiya Îranê li dijî beredayê ava bûye û li hundr de xelkê serhildêr dibînin ku bona bidestveanîna jiyanek baştir, agir berdibin bi koşka zodar.

Di dawiyê de herçawan ku Newroz bo Kurdistaniyan sembola rabûn û berxwedaniyê ye, hêvîdar im bi heman awayî jî, li panahiya Îranê de, çavkaniya derbasbûnê be bo Îranek din, em daxwazkarê vê yekê ne ku “krameta mirov”, qebûlkirina nasnameyên cuda, avakirina civakek azad li serwey hêza serkutker bi hinceta “tevahî” û “yekparçeyê” be.

»»»Dom R:3

»»»Doma R:2

Hizra totalîter ku dixwaze çavdêriyê li ser hemû tiştekê de bike, û “tevahiyê” biparêze, çarenivîsa neman û şikestê ye. Ya ku şiyana manê heye, ev nirxên mirovahiyê ne ku bi awayê aştiyane û arizomendane mirov ji hev du nêzîk dike û dibin bi sebeba çêbûna civakek kêrhatîtir bo jiyanê, li dûr her cure zilm û çewsandinekê.

Li serûbenda Newroza Kurdevariyê de, vebîranînek ji qurbaniyan, şehîdan, binçavkiriyan, bav û dayîkên cerg şewtî yên Şoreşa Jînayê dikin. Nîştiman daxdarê şehîdên şoreş û serhildanê ye, her çawan ku li ser kêla tirba “Jîna”yê hatiye nivîsîn, “Jîna can tu namirî, navê te dibe bi remiz”. Ev remizên han çiraiya rêya serbestî û serkevtinê ne, bi nemirî dimînin û mizgîniya rizgariyê didin bi me.

**Silav li malbatên serbilind yên şehîdan;**

**Silav li keç û xortên şoreşger ên Kurdistanê;**

**Silav li îradeya polayîn a girtiyên siytasî û xelkê serhildayî yên Kurdistanê;**

**Hevxebatî û yekrêziya nav mala Kurd hertim geş be;**
**Bilind û pîroz be newroza Kurdewarî**

**Mistefa Hicrî**

**28`ê Reşemeya 1401`an**
**19`ê Adara 2023`an**

# Bîranîna panaromaya şoreşa Jînayê



**N. Nûredîn Sofîzade**

Di demekê de em diçne nava sala nû û salekî tejî ji êş û azar û hemen demêde pir serwerî û xebat û berxwedana bi dijî dîktatoriyê li Îranê de em pişt serê xwe ve dihêlin, tê çavnihêrîkirin ku sala nû bibe sala bi gurtir bûna xebat û berxwedanê bi armanca sernixûniya rejîma dîktator û bidest ve hatina azadî û kerameta ku ji xelkê hatiye zevt kirin.
Ger em avrekê bidne panaromaya bûyerên sala 1401an, tejî ji xebat û berxwedan bû bi dijî rejîma dîktator, tejî bû ji xwenîşandan û nerizayetî, tejî bû ji bilindbûna dengê azadîxwazî û mafxwaziyê, tejî bû ji tomarkirin gernasî, fidakarî û can li ser destiya keç û kurên pêşeng.
Bi taybetî di nivya duyem a sala 1401an de piştî evê ku keça Kurd a xelka bajarê Seqizê bi navê Jîna Emînî, li bajarê Tehranê ji aliyê hêzên cinayetkare rejîmê ve kevte ber lêdanê û gelek belengazane canê xwe ji dest da. Şehîd bûna Jîna yê bû çexmaqê şorişekê ku ji Rojhilatê Kurdistanê ve hate lêdan û gelek nekêşa ku pelên xwe havête seranserî welatê Îranê. Şoriş û serhildanek ku bi durişma “Jin Jiyan Azadî” destpê kir, piştre durişmên radîkale sernixûniya rejîma dîktator bû sertopa armanca vê şoreşê.
Yekim car bû ku xwîna keçekî Kurd bibe sedemê şoreşekê ku seranserî welat bigre, yekim car bû ku li hember rejîma dîktatore Îslamî de, yekitî û yekrêzî di navbera hemî cudahiyên xelkê Îranê û Netewe, Ol, Çand, Itnîk, Sinf, Nawçe, Ziman, Qat, Cinsiyet, Nejad û rengên cuda de, çêbibe û bi yek dengî daxwaza sernixûniya rejîmê bikin. Ev yêke bû ku şoreşa vê carê ji nerizayetiyên derbasbûyî cuda dikir.
Rejîma dîktatore Wilayeta Feqih, bona man û parastina deshilata xwe li hember vê şorişa seranserî, ewa desta hat kir, wekî tepeseriya hovane, girtin, kuştin, û xirabkarî, lê îrada berxwedanî û berdewamiya şoreşê hinde bi hêz bû ku ev 6 mehe şoreş bi heçî avayekî mumkin diçe pêş û berdewame.
Di wan 6 mehande dema rejîmê het bi vê yekê kir ku bi tepeserî û girtin û kuştinê nikare dengê şoreşê mat bike, kevte darêtina sinaryo û pîlanên qirêj daku bi xeyala xwe çavkaniyên şoreşê bixitimîne, bo mînak çendîn caran êrîşa Mûşekî û Dironî kire ser binke û bargehên Hizba Demokrat a Kurdistana îranê û partiyên dinê ye Rojhilatê Kurdistan, li nav kûrahiya axa Herêma Kurdistanê ku dehan kes ji xebatkarên Kurd û jin û zarok bi sedemê vê êrîşê ve şehîd û birîndar bûn, vê yekê netinê nekarî gelê Kurd û xebatkaran ji xebat û şoreş û pêşengiya şerê bi dijî dîktatoriyê sar bike, belkî hinde din li ser domandina xebatê mukum û rijd kirine û îrada gelê me ji heçî demên derbas bûyî bihêztire.
Komkujiyekî hovane li nava gelê Belûç li Zahidanê kir ku sedan kes têda şehîd û birîndar kirin, vê cinayeta rejîmê netinê nekarî dengê gelê Belûç mat bike û wan ji şoreşa seranserî weqetîne, belkî em dibînin yekîtî û li meydanê de mana Belûça bi avayekî berdewam li hemî rojên Înê deshilata riziye dîktatoriyê xistiye lerzînê.
Di wî heyamê derbasbûyî de Îdama xortên şoreşvan îşkence, girtin, sepandina hukmê giran bi ser wan de, cinayetên gelek hovane bi dijî Jin û Keçên pêşeng, nekarî dengê şoreşê, dengê merg ber dîktator, mat bike.
Çendîn sinaryo û pîlanên dinê ye rejîmê, wekî êrîşa rejîmê hebxwe bo ser Şaçiraxê, herifandina Metroplê, êrîş û agir berdana girtîgeha Êvînê û Lakana Reştê, tenê bi armanca xapandina bîrûraya gişî û dûrxistina çavên civatgehê ji vê şoreşê bû ku bi keyfeşî ve rejîmê nekarî di encam dana wan pîlanêt qirêje xwe de, bigehe çi yêk ji armancên xwe.
Rejîmê û deshilatdarên cinayetkare vê û bi taybetî Sipaha terorîse Pastaran, herwekî adetê xwe yên hemî carê cehd kirin ku vê şoreşê girêdin bi destêverdana welatên bîhanî, wekî Îsraîl, Amerîka, Ewropa, erebistan, Herêma Kurdistan û Azerbaycanê, Lewma hevdem di gel şoreşa navxweye xelkê Îranê bi dijî rejîma Dîktator, Hêzên rejîmê gefa êrîşa ser Ewropa, Erebistan, Herêma kurdistan û Azerbaycanê dikirin û li ser sinûrên Herêma kurdistanê û azerbaycanê manovrên serbazî encam dan, hemî cehda rejîmê ev bû ku bala her kesî bo aliyê şer û aloziya Îranê û yêk ji wan welatan rabikêşe, daku bi vê hêcetê jî bikare şoreşa nav xwe bi tundî tepeser bike, lê hemî ev pîlanêt rejîmê jî betal û pûç derkevtin.
Hevdem di gel şoreşa navxweye welat, xelkê Îran û Kurdistanê û hemî netewên dinê ên li diyasporayê li welatên cuda cudaye cîhanê, ji bona piştewanî ji şoreşa nav xwe û herwisa rakêşana bala bîrûraya giştiye cîhanê bo aliyê vê şoreşê ve, berdewam girseyên xwenîşandanan bi rê ve birine û her ev yêke jî bû sedemê piştgîriya gelek wqelatên cîhanê ji vê şoreşê, ku gelek biryar û helwestên girîng û bi bandor bi dijî rejîma Îslamiya Îranê hatne danê.
Vê dawiyê jî rejîm bi armanca hem çavtirsandina xelkê, û hem tol vekirina ji Keç û Jinan û bi taybetî ji Keçên xwendikar, êrîşa biyolojîk kire ser sedan zanko û qutabxanan û hezaran Keçên pêşengê şoreşê jehrawî kirin, bêguman ev kiryara hov û terorîstiye rejîmê netenê nikare kesê çavtirsandî bike, belkî bi berewajî dibe sedemê kerb û kîna xelkê û bi taybetî keçên şoreşvan û îrada wan ya bi dijî dîktatoriyê bihêztir dike.
Di dawiyê de ewa ku hewceye tekesî li ser bête kirin ji bona berdewamiya xebatê û bi armanca sernixûniya rejîma hov û dîktator, ew ku boguman îrada şoreş û berxwedanê ji heçî demê bihêztire, tenê hewceye ev yekitî û yekrêzî û yekdengiya di nava xelkê Îranê bête parastin ku çi pîlanekî rejîmê heya niha nekariye têk bişkêne, hevdem yekîtî û hevbendiyekî bihêz di navbera girûp p aliyên opozîsyonê bête çêkirin ku hemî xelkê îranê benda çêkirina altirnatîvekê dikin, û şoreş û berxwedan berdewam be, bêguman rejîm li ser kendalê sernixûniyê ye û bi vê hest û îradê ve em bila biçne nava sala nû û vê salê bikne sala geheştina bi azadî û demokrasî û mafên her aliyekê.

# Erê gelo gelên Tirkiyê dê bikarin Gandiyekî bi Afirînin



N:Rostem Cihangîrî

Li 15ê meha Nîsanê anku meha 5ê gûherîn dê çê bibin, an, na?!

Tirk û hilbijartinên wê carê Welatê Tirkiyê nêzî dû mehên din, hilbijartinên giştî û yên serkomariyê û hilbjartinên parli mantoyê dê bên lidarxistin, li vê hilbijartinê de 35 partî beşdarî dikin, niha ew partiyên han li ser çend îtfaqan parve bûne, hinek jî serbixwe dê herin nava kêberkêya hilbijatinê.

Wê carê hilbijartin gelek hesas û kirtîk e.

Aya paş hilbijatinê sîstema serokayetiyê dê bimîne an dê bê guherîn, 550î parlementer dê bên hilbijartin.?!

Bo guherîna vê sîstemê gorî yasaya giştiya welat, dibe ku dengê du li ser sê li parlemenê bidest bîne, îca hingî dê bikarin wê sîstemê biguherin. Yek jî serkomar dê bê hilbijartin.

Piştî sala 2003`an, Partiya Dad û Pêşkevtinê yanî(AKP) bi serokatiya Recebteyb Erdoxan hate ser kar.

Li wî serdemî de bi van propagendeyeke pir bihêz, mezin û bi bername û pirojeyên nû. Bidana qewil û belênên mezin û anîna bin pirsyarê û îslah kirina dîstema komarî ya laiyk. Êxistana pirsa Kurd û qewilê çareseriya pirsa Kurd li çarçêvêya welatê Tirrkiyê, her usa çareser kirina laçik û desmala serê jinan ku wî zemanî bi remî qedexe bûn jin desmalekê serê xwe girê bidin.

Çêkirina rewşa jiyana xelkê li warê êkonomî û debara jiyana welatiyan? Bi kurtî bi siloganên cîbicî kirin û pan û berin kirina Demokrasîyeke zêdetir. Ya dawî, çûn bo nava yekîtiya Awropayê, qebûlkirina hemû bername û qanûnên însanî û hiqûqî û yasay.

Lê, paşî zêdetirî 20 salan li hikimdariyê, niha li wî welatî nêzî bi hemû ew qewlên day nehatin cî bi cî kirin.

Mesela Kurd tenê bi dana Tv yeke Kurdî bi navê TRT Kurdî hat xilas kirin, ragihandin ku me mesela Kurd çareser kir, êdî tiştek binavê pirsa Kurd nemaye, ya hey, mesala terorê ye.

Azadî û demokrasî, sal bi sal hatin kêm kirin.

Li dijî çareserkirina pirsa Kurd e li hemû beşên Kurdistanê ,bixasmanî li Rojavayê Kurdistanê, ku bi êrîşên xwe bo ji nav birina Rojavayê, ewa dest ê wî hat kir, çendîn gund û bajarên Kurdistanê dagîr kir, gelê Kurd li Rojavayê welat tûşî çermeserî û kuştin û derbederiyê bû. Li Başûrê welat piştî referandoma Kurdistanê bertekeke gelek mezin li xwe nîşan da û digel dewleta Îranê hevpeymanî yek li dijî hikumeta Herêma Kurdistanê pêk anîn?! Eger welatên Amerîka û Awropa nehatiban û bertek nîşan nedaban.? Wan qewl dabûn bi Îraqê ku hikûmeta Kurd xilas bikin.

Dezgeha dadê zêdetir kete bin bandora hikûmetê, ragehandin sal bi salê hat bertesk kirin, gihîşte wî cihî êdî nêzîk bi tevahiy dibe wê bêjin ewa ku dewlet û hikûmet dixwazin. Êkonomî ya wî welatî htibara wî ber bi lawazîyeke tirs hêner ve bi tûndî pêngavan dihavêje.

Rewşa jiyana gel xirabtir bûye. Gendelî û rişwet bi van hevalên ku tên roj bi rojê zêdetir bûye. Jiyana xelkê wî welatî tûşî zehmetiyên mezin bûye.

Ti biryar û qanûnên Awropayê




bixasmanî ên Dezgeha Dadê qebûl nekir, her hemû red kir, Dezgeha Dad a Awropayê biryar da, Selahedîn Demirtaş azad bikin, lê hikûmeta Tirkiyê red kir, niha êdî pêwendiyên wî welatî tev Awropa û bigire heta Amerîkayê pir lawaz bûne. Ji aliyek din ve pêwendiyên wî digel welatê Îsraîl û hinek welatên Erebî jî lawaz bûye.

Demokrasî nek her zêde nekir, ya hey jî lawaz kir, ev jî piştî cî bi cî kirin an guhertina sîstema parlemanî bi Sîstema serokayetiyê.

Wana gelek bûyerên din roj bi rojê Hizba AKPê nifûza xwe kêm kême ji dest daye. Bixasmanî nifûza wî li nava Kurdên bakurê welat gelek ji dest daye, ew jî bûye sedema wê hindê ku AKPe xwe bo aliyê Partiya Neteweperest vate?(MHP)a bi serûkatiya Dewlet Baxçelî û çend partiyên din yên neteweperest bûne hevpeyman.

Her ev yeka jî bû ku cûdabûn li nava partiya wî de çê bibin, ku heta niha du partî lê cuda bûne û tevlî Eniya neyar a serkomar yanî Erdoxan bûn e?! Erdoxan navê wan bi xîyanetê tohmetbar kir.

Bi kurtî niha êdî bas li wê tê kirin ku serdemê Erdoxan wê biserçûye, dibe here.

Niha çendîn enî an hevgirtin li meydana sîyasiya hilbijartinê ya welatê Tirkiyê de pêk hatine, lê yên herî mezin û bi bandor eniya Cimhûr e ku li AKP û MHPe û çend partî û aliyên neteweperest in.?! Eniya duyem Eniya Milete ku li şeş partiyan pêk hatiye. Partiya CHP ku partiya Atatûrk anku Mistefe Kemal bavê ruhî yê welatê Tirkan e bi serokatiya Kemal Kiliçdaroxlo ye, ÎYÎ Partî bi serokatiya xanima Meral Akşener ku çend sal berî niha li partiya netewperest a MHPê cudabû, partiya xwe bi navê Partiya Baş pêk anî. Partiya Si`adet ku partiyeke Siyasî û Îslamiya seroke eniya wî bi navê prefsor Necmesîn Ebakan e, ku Erdoxan û hevalên xwe li wê partiyê cûda bûn, Partiya Dûvaroj an Dahatî, bi serokatiya Ehmed Dawûdoxlo ye. Navbirî çendîn salan Wezîrê Derve yê Tirkiyê û serokwezîr bûye, li hikumeta Erdoxan de, bilî vê ku li îdare kirina welat û hikûmetê de zor hirz û raman û nêrînên wana li hev cûda bûn, bi mecbûrkirin yan zexit lê kirin, îstifayê bide, niha ew û partiya xwe zor dijî Erdoxan û partiya wî ne.

Ali Babacan, yek ji damezênerên AKPê û paşan bû bi wezîrê malî û abûrya hikûmeta Erdoxan, wî jî partiyek binavê Dewa Partî pêk anî ku tevlî eniya Milet bû. Eniya Kurd.

HDP bi partî û rêxistênên ser bi wî, bixwe eniywk Kurd e, lê mixabin ku hîn nekariye mala Kurdan bike yek. Çendîn pertî û rêkxistênên din yên wek: Partiya sosyalîst a Kurdistan PSK, Partiya Azadî a Kurdistanê PAK, Partiya Maf û Azadiyan HKP, Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Bakur, Eniya Demokrat a Kurdistanê, tev çend rêkxirawên din, bi hevre kar dikin lê gelek jî yek dengî li nava hinek van de nine, lê li ser

»»»Dom R:5

»»»Doma R:4

hev bixwe partiyên kevin çihê xwe li nava gel de hene, hemû bi HDPê re bibin hevdeng, aliyê kîjan eniya hey weke, (Eniya Komarî) û (Eniya Milet) va tê çavnhêr kirin dê ser bikeve. Niha Kurd bûye kilîla serketin yan ketina yek ji van eniyêm me nav lê birî, lê herwek me got nav mala partiyên Kurd gelek baş nine?! Hêvî dikim baş bin, HDPe dibe bibe çetira hevgirtina Kurdan, di kare wê rolê bilîze. Eger nek hemî Kurd û hem jî HDPe wê zirarek mezin bikin.
HÛDAPAR:Partiyeke îslamiye, niha wê qirar daye ku bo serkomariyê dê pişta serkomarê niha yanî Recebteyb Erdoxan bigire, yanî dê piştewaniyê li Erdoxan bike, ew biryara pêngaveke bi qazancê Erdoxan e.

Aya Kemal Qilîçdaroxlo dê bikare dengê hemû wan partiyên ji bilî HÛDAPARê box we bibe, an na. Kurdan zor xastên rewa hene. Li destên hikûmetên yek li dûhev de gelek çermeserî dîtine, dibe bêjim hikûmeta niha jî gelek çermeserî û zext û zor aniye serê Kurdan, li Başûr,li Bakur,li Rojavayê.

Kurdên bakur daxwaz û hêviyê dikin ku hikûmeta niha bê guherîn, lê ya rast be ti bawerî yan bêjim hêviyek bi Eniya Milet jî nine, çonkî li manîfesta xwe ya bo hilbijartinan de, ti tiştek bo çareseriya mesela Kurd neanîn?
Yan ranegihandin. Herçend li nava Eniya Milet de partî û hinek jî Cimûriyet HALK partî(CHP) hinek raman bo çaresera pirsa Kurd gotin, lê nekarîn bikin nava pirojeya Eniya Milet de, seba xatira wê hindêye ku gelê Kurd û partiyên Kurdan ketine nava hizr û fikiran de, biyar dan hinek zehmete.

Eniya Kurd nekarî partiya Îslamî yanî HÛDAPARê bo aliyê xwe bikişînin, lê seba xatira dîda îslamî Erdoxan rihet karî bo aliyê xwe bibe, partiya îslamî bi wê biryarê li beryeya wan de ye û çi bixwaze yan nexwaze li milê Netewî û Kurdayetiyê hinek dûr dikeve.

Kemal Qilîçdaroxlo û Eniya Milet eger bixawzin hikumdariya wê carê li hilbijartinê de bidest bixin, dibe çareseriyekê yan çirakeskekê bo Kurdan hil bike, dibe hinek li ramanên yek milet û yêk ziman bêne der, li îdara welat de Kurdan tê de weke nûnerê Kurdan cih bike, aya Kemal Qilîçdaroxlo dê bikare wê şihametê bikar bîne û navê xwe heta heye li dîrokê de bide sebit kirin , mafên Kurdan hinek bi resmî bê nasîn?! Yan na?! Dibe ew jî bizanin, ku Kemal Qilîçdaroxlo li dû aliyan we li jêr zext û fîşarê deye? Yek li nava partiya xwe, çimkû partiya wî xwe bi mîratgirê hizr û ramanên Atatûrk partiya wî dizanin, bi dirêjahiya dîroka Heştê salan, wê ramanê û wê hizrê belayên mezin anîne serê Kurdan.?

Niha hinek zehmete, lê namumkîn nine, dizanim CHPê li jêr serokatiya Kemal Qilîçdaroxlo de gelek guherîn çê kiriye, li nava bername û

programa wê partiyê de, ku caran ba ew bive bû, lê wî kir, lê hîn gelek maye.
Du Li nava Eniya Milet de jî ew li jêr zext û fîşarê deye,bixasmanî li ser mefên Kurdan?! Aya Kemal dê bikare bibe rêberek ku rîskan bike, bibe firyat res, rêberek karîzmatîk, bikeve nava dilê hemû gelê Tirk û Kurd de.

Kurd dibe wê derfetê bi girîng bizane û li ser mifahên partî û kesî ranewestin?! Belku dibe bidin berhev, bername û manîfestek mişterek çêbikin û rabigihînin, kîjan mil dikare çende mafê Kurd biresmî binase, çende dê bikare cî bi cî bike.

wekî meriv çav li eniya Tirkan dike, çep û rast îslamî û neteweperet gelek li ser meselên malî û netewî yên xwe bi dilekî fireh bi hevre rûdinên û meselên îdolojîk û îxtilafên siyasî didin aliyekê û îtilafan pêk tînên?

Li ser mifahên milî û berjewendiyên Tirkan dibin yekdeng, gelo Kurdo hûn çima wê nakin, aliyê kêm nabêjim li dujminê xwe fêr be, lê li neyar û reqîbê xwe tiştan wergirin.

Bibin yek deng yek hizir, dê bikarin pêngav bi pêngav mafên xwe bistînên?! Nexo hûn pêngav bi pêngav dê paşve herin û bişkên.

## Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê ya li Ewropayê di merasima biaxê spartina Nesrîn Qasimlo de beşdarî kir



Nûneratiya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê ya li Ewropayê di merasima biaxê spartina Hêlên nakirî bi (Nesrîn) Qasimlo de li Parîsa paytexta Firansayê de beşdarî kir peyama vê navendê bo amadebûyên merasimê pêşkêşî kir. amadebûyan kir.

Peyama Nûneratiya Yekîtiya Kurdistana Sûriyê ya li Ewropayê ya di merasima biaxspartina Nesirîn Qasimlo de ji aliyê Anahîta Hemo ve bi zimanê Firasî hat xwandin.
Di vê merasimê de, bilî endamên rêberiya PDKÎ û endamên Hizbê yên li dervey welat, Wezîrê berê yê Firansayê Birnar Koşinêr yê dostê gelê Kurd jî beşdar bûn.

Roja Înê rêkevta 26`ê Reşemeya 1401`an, demjmêr 2:00 bo 3:00 paşnîvro, bi amadebûna "Hesen Şerefî" Endamê Navenda Birêveberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê û mamoste "Ebdula Hesenzade", sîmayên naskirî yên Demorkatê û komek din li têkoşerên Demokratê, rêûresimek kêrhatî bo dawîn xwatir xastin li termê "Nesirîn Qasimlo" hevjîna şehîd "Dr. Ebdulrehman Qasimlo", sekreterê berê yê PDKÎ û rêberê navûdeng yê bizotineveya Kurd birê ve çû.

# Navenda Hevkarî: Newroza me ya îsal Newroza gelan e ji bo herifîna rejîma Îranê

**Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê derheq boneya Newrozê daxuyaniyek belav kir û daye zanîn: Newroza îsal Newroza şoreşa Jînayê li dijî rejîma Îranê ye.**

**Deqa daxuyaniyê wiha ye:**

**Newroz hêmaya yekgirtin û berdewamiya xebata hevbeşî ya gelên Îranê ye**

**Gelên azadîxwaz ên Îranê**

**Hevnîştiman û xelkê xebatkar ên Kurdistanê!**

Newroza îsal Newroza şereşa Jînayê ye. Newroza demsala nû a xebata berdewam ya gelên Îranê bo herifîna Komara Îslamî û dawîpêanîn bi desthilata siyasî ya dîktator li Îranê ye. Hatina wê Nerwoza teybet û mezin li hemûyan pîroz be.

Bi helkefta hatina cejna Newrozê û hatina sersala nû, em di destpêkê de silavên xwe pêşkêşî malbatên şehîdan û girtiyên siyasî, bi taybet yad û bîreweriya şehîdan û canbexşînerên şoreşa Jînayê dikin ku bi xwîna xwe ya geş û bi gorîkirina canê xwe yê şîrîn bûne agirê meşxelên xebata rizgariya netewên Îranê, bo jinavbirina desthilata dîktatorî ya Komara Îslamî.

Em di demekê de ber bi sala nû ve diçin ku gelên Îranê saleke tijî hemase û şanazî bi rê kirin û bi şoreşa jiyanê û serhildana berfireh a mafxwazaneya xwe, Komara Îslamî rû bi rûyê mezintirîn krîza rewatiya siyasî kirin. Berdewamiya siyaseta destêwerdan a Komara Îslamî li karûbarên navxweyî û binpêkirina serweriya welatên navçeyê û pêbendnebûna rejîmê bi yasayên navneteweyî, piştevaniya rejîma Îranê ji Rûsiyê û beşdariya wê di şerê Ukraynayê de ji vê yekê zêdetir bû û wisa kir ku ew rejîme di hevkêşeyên navdewletî de jî, zêdetir tûşê perawêzê bibe û rastî dorpêçên zêdetir bê.

Gelên azadîxwaz ên Îranê!

Serhildana nû ya gelên Îranê ku ji Kurdistanê ve çexmaqeya wê hate lêdan û dirûşm û nirxên şoreşgêrî yên wê ji Kurdistanê ve derbasî navçeyên din ên Îranê bûn û piştevaniya civaka navdewletî li pey xwe anî, encama zêdetir ji çar dehikan a siyaseta dijî gelî ya Komara Îslamî, serkuta maf û azadiyên xelkê, tepeserkirina dengên cuda, kelekbûna krîzên aborî û civakî, dîlgirtina xelkê Îranê ji bo armancên siyasî û îdolojîkên rejîmê û di heman demê de berxwedan û xebata gelên têkoşer ên Îranê li hember vê rejîma qirêj û devbernedan û teslîmnebûn û berdewambûna wan di pêxema bidestvehatina maf û azadiyên xwe ne.

Ji songeha xebat û qurbanîdana dehan saleya gelên Îranê ve, îroke refên xelkê li dijî desthilatê yekgirtî û qahîmtir ji hemû demekê ye û tevî siyaseta hertimî ya rejîmê ji afirandina fitne û dualî di navbera gelên Îranê de, hevpeywendî û hevxebatiya netewe û pêkhateyên Îranê, hin qonaxên gelek baş ber bi pêş ve birine; Serkevtin bi ser Komara Îslamî de û serxistina wê xebata mezin jî, her bi berfirehkirina vê yekîtî û hevgirtinê ve girêdayî ye.

Xelkê bi helwêst û xweragir ên Kurdistanê!

Gelên xeyrî Kurd ên li Îranê û raya giştî ya cîhanê dengê têkoşîna we ya rewa bihîst. We ku di çar dehikên borî de hertim ji Komara Îslamî re gotiye "Na" û we di heyama jiyana wê rejîmê de Kurdistan kiriye çepera xebat û azadiyê. We ku zêdetirîn xwîn daye û zêdetirîn nirx ji bo parastina alaya xebatê û mafxwaziyê daye. We ku pitir ji çar dehikan e bi tundtirîn şêwe rastî tîxeya serkut, cudahîdanîn, perawêzxistin û pêla helandina zimanî û kultûrî hatine û bi tohemtên bê bingeh mafxwazî û nasnamexwaziya we rastî êrîşê hatiye û armancên we yên bilind ên mirovî ji aliyê desthilatê ve hatiye çewtkirin û berevajî hatiye nîşandan.

ji rûyê aborî, kultûrî û civakî ve hatine çewsandin û nîştimana we mîlîtarîze kiriye, hizbên we yên xebatkar rastî êrîşên terorîstî hatine û hatine mûşekbarankirin. Lê tevî wan hemûyan, Kurdan dev ji xebatê bernedaye û xebata hizbên siyasî, têkoşerên bi helwêst û mafxwaziya mamosteyan û çandiniyan, xwendekaran, jinanan, kedkaran, çalakên wêjeyî û medenî, jîngehparêzan, zimanparêzan û qatên cur bi cur ên dinê yên civatgehê berdewam berfireh bûne.

Di niha de jî ku Komara Îslamî di hemû rehendan de gihîştiye bombestê û derbsbûn ji vê rejîmê daxwazkariya sereke û hevbeşiya tevahiya gelên Îranê ye, Kurdistan wek hertimî rêşiken û alahilgirê wê xebata pîroz e.

Di wê qonaxa hestiyar de, Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê berxwedanî û xebata netewayetî û mafxwaziya xelkê Kurdistanê li dijî Komara Îslamî bi bilindî dinirxîne û şanaziyê jî bi vê yekê dike ku xelkê Kurdistanê tevî xebat û têkoşîna bê westan û tund li dijî rejîmê, wek keleheke qahîm li pişt hizbên xwe mane, û dengê wan li ser şeqaman bû û xwanexêtî ji hereketa rizgarîxwaziya gelê xwe dikirin.

Navenda Hevkarî hevdem alxahîn e û li ser wê bawerê ye ku ew xebate dîrokiye, rewa û berheqa me demekê ser dikeve ku yekrêziya xelkê û aliyên siyasî misoger be û neyê derzkirin. Eva jî îrade û hest bi berpirsyaretiya hemûalî ji aliyê hemûyan ve dixwaze.

Xelkê berpirsiyar ên Kurdistanê!

Rêûresmên Newrozê li Kurdistanê bi dirêjahiya salên borî bi peyam, dirûşm û sembolên netewî hatine lidarxistin û ev jî nîşaneya bilindbûna hişmendî û hişyariya netewî û birêkxistinkirina civaka Kurdistanê ye.

Lewam emê îsal merasîmên Newrozê di asteke berfireh de û bi yekdengî û bi nav û dirûşm û sembolên taybet ve bi rê ve bibin û emê bikin bi derfet ji bo gihandina hin wate û peyamên xwe yên netewî û nasnamexwazî.

Navenda Hevkarî bi tekezî li ser yekgirtin, yekrêzî û pêkvebûn di hemû ast û qadan de ber bi saleke nû ji hevxebatî û têkoşîna siyasî û netewî ve pêngavan diavêje û alxahîn e jî xelkê Kurdistanê dê bi avêtina axabanûyan li ser milê xwe, danîna hewrî bi serê xwe, û bi destgirtina gulên sor tabloyek ciwantir ji berê bi îradeyek netewî ve xwe nîşan bidin. Em alxahîn in ku malbatên serbilind ên şehîdan bi hilkirina agirê Newrozê di rêûresmên Newroziyên îsal ên Kurdistanê de, meşxela xebatê bo azadiyê digirine destê xwe û tevahiya xelkê Kurdistanê bi yekgirî li dijî siyasetên dujminkarane ên rejîmê derdikevin û îsbat dikin wek neteweyek xebatkar bo bidestxistina maf û azadiyên xwe berdewam û rijdtir in.

**Newroz li we hemûyan pîroz be.**

**Silav li şehîdên rêya azadiyê**

**Silav li îradeya girtiyên siyasî**

**Silav li hevxebatî û yekgirtina gelên Îranê**

**Serkeve xebata rizgarîxwazaneya gelê Kurd**

**Serkeve xebata gelên Îranê bo herifîna Komara Îslamî**

**Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê**

**Newroza 1402an a Rojî**

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicrî:”**
Em dixwazin krameta mirov, qebûlkirina nasnamseya cuda û avakirina civakeke azad li serweyê hêza serkutker bi hinceta “tevahî” û “yekîtiyê” be




**“Mesrûr Barzanî”:**

Em rê nadin ti kesekî rêya pêşketina Kurdistanê li me bigire



**“Mîr Feysel Bin Ferhan:”**

Rêkeftina me bi Îranê re nayê wateya çareserkirina hemû nakokiyan




**“Kiliçdaroglu”:**

Çareseriya pirsgirêka Kurd, parlamento ye!

# Kurtîyek li ser belgeya “Hevgirtin ji bo Dêmokrasî û Azadî li Îranê”



**N:Agirî Îsmaîlnijad**

Di roja 10’ê Adara 2023’an de 6 çalakvanên siyasî yên Îranê ku yek ji wan Kurd e, nameyek bi navê “Hevgirtin ji bo Dêmokrasî û Azadiyê li Îranê” belav kirin!

Bi dîtina min, ji ber ku hêzeke cîbicîkar li pişt wê nîn e û ew li Îranê jî xwediyê pêgeheke civakî ya bihêz nîn e, ew kiryara wan, zêdetir weke nerînekê tê dîtin!
Lewma divê em vê belgeyê weke belgeyeke siyasî-hiqûqî nebînin û amajê pê bikin.
Xalên baş ên vê Mensûrê ev in:

Yekemîn xala baş ev e ku di xala 3. de basa “nenavendîkirina desthilatê” dike, berê partiyên Îranî yên ku li dijî fêdêralîzmê bûn, eger basa “nenavendîkirina îdarî” dikirin, bi eşkere basa “nenavendîkirina îdarî” dikirin. Tişta ku di nivîseke Îranî de li ser “jinavbirina navendgiriyê” tê gotin, xaleke baş e.

Xala din wate xala duyemîn a baş jî ev e ku di xala 12 de basa “wekheviyê ji bo hemû qurbaniyên Komara Îslamî” dike, ev xal ji bo me Kurdan girîngtirîn xal e. Ji ber ku dewleta Îranê li Rojhilatê Kurdistanê zilm li gelê Kurd kiriye.

Xala sêyemîn a baş jî ev e ku manîfesto bi awayekî berdewam amaje bi yasayên navdewletî dike, eger bingeha yasa li Îranê vegere ser yasayên navdewletî, baş e! Ji ber ku nivîsên hiqûqî yên navnetewî piştgirîya ramanek an neteweyek an olek taybetî nakin.

Fi hember de qelsiyên Mensûrê ev in:

1.Giştpirsî Her ku mafê neteweyên ne Fars tê gotin, di pêşnûmeyê de hatiye giştîkirin.

Bersiv: Di vê navberê de ti kesek berpirsiyariyê nagire ser xwe û her kes vî tiştî li gorî berjewendiyên xwe şîrove dike.

B: Ji ber ku sazî û dezgehên Îranê ji xeynî saziyên dewletê, li ser bingeha parastina neteweya Fars in, dema ku gotûbêjek giştî tê kirin, sazî ji bo parastina armancên xwe yên bingehîn vekirî ne.

Duyemîn xala nebaş ev e ku, xalên ku wek rêkarên ji bo jinavbirina Komara Îslamî tên binavkirin, hemû dewletparêz in û nivîskarên yasayê tenê dikarin li ser bingeha mafên mirovan bi dewletan re têkilî daynin.

Di vê navberê de ji bo wan, Komara Îslamî bi rastî ne pîvanek e.

Sêyemîn tişta nebaş a Menşûrê ev e ku, di beşa baweriyên giştî de, xala yekem bas ji vê yekê dike ku şêweya hikûmetê bi rêfrandomê tê diyarkirin, ji bilî wê yekê jî, nehatiye destnîşankirin gelo kîjan şêwe hikûmetê şansê bidestxistina dengan heye.

Divê ew hewl bidin pêşî li zordariya xwe bigirin.

Ya girîngtir ev e ku Tevgera Kurdistanê li ser bingeha serweriya takekes û neteweya Kurd hatiye avakirin, mafê serweriyê nayê dengdan, hûn dikarin mînakên wek dewletên Amerîka yan jî Yekîtiya Ewropayê . Ki bo mînak di encama rapirsiyê de li xelkê hat pirsîn gelo hûn dixwazin ji Yekîtiya Ewropa cuda bibin yan na!

Çarem, di beşa “Edaletê” de xala 11’an dibêje “parastina avakirina dadweriya serbixwe” ji ber du sedeman xelet e:
Bersiv: Îranê di hemû dîroka xwe de xwedî dezgeheke dadwerî ya serbixwe nebûye, lewra divê ev hevok bi israr were nivîsandin, ne tenê “piştgirî”.

B: Ger baweriya me bi cudabûna hêzan di biryarnameyê de hatiye gotin, divê desthilat hem li ser asta etnîkî û hem jî li ser asta îdarî were dabeşkirin, metna xala 11ê bi rastî jî nîşan dide ku di asta îdarî de bawerî bi cudabûna desthilatan nîne. qedandin.

Manîfestoya “Hevgirtin ji bo Dêmokrasî û Azadiyê li Îranê” ji aliyê kurdan ve tu destkeftiyên taybet nîne, ji aliyê alîgirên Riza Pehlewî ve gelek paşvekêşî heye, ji ber wê jî wek mensûrekî baş tê dîtin.

Eger em bi perspektîfa Kurd lê binêrin, birêz Ebdullah yê ku ew biryar îmze kiriye, ji ber ku biryarname ne xwediyê desthilata îdarî ye û ji ber ku ti mafên neteweya Kurd qedexe nake, qeyranek ji bo Navenda Hevkariyê çênekiriye! Lewma em nikarin bibêjin ku birêz Ebdulla Muhtedî li Navenda Hevkariyê xistiye!

Di şûna wê de, eger hemahengî di navbera navend û girûpê de hebe ji bo geşepêdana xwenîşandanan li hundirê Îranê, heta em dikarin bêjin ku îmzekirina rêkeftinê dibe derfetek ji bo Navenda Hevkariyê.

Bîrveanîn, Navenda Hevkariyê ji bo stratejiya dabînkirina mafên netewa Kurd hate damezrandin û manîfesto ji bo derbaskirina Komara Îslamî hate nivîsandin!

Di paragrafa min a dawîn de dixwazim behsa “pêşveçûna domdar” bikim.

Di van salên dawîn de belgeyên Îranê behsa siyaseta mezinbûna domdar dikin. Tişta girîng ew e ku bikarhênerên mezinbûna domdar nizanin wateya wê çi ye. Pîşesazî, siyaseta navxweyî, polîtîkaya derve, hiqûq, qanûn, hêzên erdnîgarî û mirovî tevlîhev dike.

# Derfetên dubarebûna diyaloga kurdî



N: Ebdûlazîz Qasim

Piştî derbasbûna pitir ji salekî li ser şerê Rûsya-Ukraiyna di 24ê Sibata 2022an de, yê berdewam heta îro, ku bû sedemê peydabûna nakokiyên mezin di navbera dewletên rojavayî û Rûsiya de, herwisa bû sedemê peydabûna qeyraneke aborî mezin ku ew jî heta niha ber bi zêdebûnê diçe.

Amerîka û welatên Ewropî di çarçoveya şerê Rûsiya û Ukraiyna de, ji bo bihêzkirina piştevaniya navdewletî ya li dijî Rûsyayê hewl dan ku ji Erebistana Siûdî û dewletên Erebî yên kendavê piştgiriyê werbigirin û herwisa Rûsiyayê jî têkiliyên xwe digel Tirkiyê û Îranê bihêztir kirin, heta ku têkiliyên Rûsiya û Îranê gihiştin astekî bilind ji piştgiriya siyasî û leşkerî û rêjîma Îranê bû beşek ji şerê Rûsiyayê li dijî Ukraiynayê.

Wisa diyar dibe ku piştî peydabûna nakokiyên mezin di navbera Amerîka û Rûsiyayê de, niha nakokiyên siyasî û dîplomatîk li vê dawiyê di navbera Amerîk û Çînê de jî peyda dibin û têkilî ber bi xirabûnê ve diçin,nemaze ku Çînê di heyamê çend rojên borî de karî bi roleke mezin rabe di navbeynkariya Erebistana Siûdî û Îranê de, bo vegerandina têkiliyan di navbera wan de û wisa dixuye ku dibe pêgeha Pekînê di Rojhilata Navîn de zêdetir bibe û bi taybetî li herêma Kendavê ya dewlemend bi neft û gazê, hevdem ku ev “lihevkirina” Îranî-Siûdî, pirsên gelek bi xwe ve digire, nemaze li ser dosyayên navçeyî yên bi salan bûne qadên hevrikî û şerên niyabetî “wekalet” di navbera wan de.



Ne tinê li Rojhelata Navîn, herwiha dibe ku Çîn bi rolek mezin rabe li ser asta cîhanê, bi taybetî di rawestandina şerê Rûsiya û Ukraynayê de û bihêzkirina pêgeha xwe digel welatên Ewropa nemaze piştî serdana serokwezîrê Almanyayê Olaf Scholz, û tê pêşbînîkirin ku her yek ji Serokomarê Fransayê Emmanuel Macron û Serokwezîrê Avusturalya Anthony Albanese di dawiya vê salê de serdana Çînê bikin.

Wusa dixuye ku Çîn piştî îzolasyoneke dirêj, ne tinê di navçeyên di bandora dijberê xwe Amerîkî de serkevt, herweha di navçeyên di bandora dostên xwe yên Rûsiyan de jî serkevt, ji ber ku hewlên Rûsiyayê ji bo pêkanîna lihevhatinekî di navbera Esed û Erdogan de sernekevt, wekî me dît ku piştî dubarebûna têkiliyên çend dewletên Erebî û herêmî bi rêjîma Sûriyê re piştî karesata erdheja di 6ê Sibatê de û “lihevhatina” Si’ûdî û Îranê, serdana serokê rêjîma Sûriyê Beşar Esed ji bo Moskoyê di rojên 16 û 17ê Adarê de ji aliyê Rûsiya ve bi serdaneke dewletî hat pêşwazîkirin, bo yekem car ji destpêka şerê Sûriyê ve, piştî ku serdanên wî bo Mosko tinê bê protokol dihatin pêşwazîkirin, û careke din Bişar Esed hewlên Rûsiyayê ji bo hevdîtina Serokkomarê Tirkiyê Receb Erdogan red kir, û di hevpeyvîneké de ligel êzgeha Sputnikê, Serokê Sûriyê li Moskoyê got ku ti wateya hevdîtinê nîne heta ku Tirkiye “dagirkeriya xwe ya neqanûnî” bi dawî neke, û got ku divê Tirkiye dest ji piştgirîkirina terorê berde, û ti hevdîtinê digel Receb Teyib Erdogan re nake, heta ku Tirkiye hêzên xwe ji bakurê Sûriyê vekişîne.

Helbet, bidawîhatina dagîrkeriya Tirkiyê û çeteyên wê yên terorîst li ser navçeyên Kurdî, dibe destkeftek mezin bo xelkê Kurd li Efrîn, Girêspî û Serêkaniyê ku li mal û warên xwe vegerin û bibe sedem bo rawestandina pirojeyên Tirkiyê yên guherîna demografîya navçeyên kurdî, lê li aliyek din bihêzbûna rola Îranê di Sûriyê de, ew jî li ser doza Kurdî cihê metirsiyek mezin e, tevî wekî dixuye ku Amerîka heta demekî nediyar li herêma kurdî ya Rojhelatê Firatê dê mîne, û helbet ku Amerîka dê pitir alîkariyê bide navçeyên kurdî yên di bin kontrola HSD de, herwisa dûr nîne ku aliyên kurdî bi serpiştiya wê careke din dest bi gereke nû ya diyalogê bikin, ku ne tinê di navbera ENKS û PYD de be, belkî bi beşdariya hin aliyên kurdî yên din jî bibe, wekî sazî û partiyên derveyî van herdu aliyan.

# Li Dirbêsiyê bi hatina Newrozê dirûtina cilûbergên kurdî zêde bûye

Berî cejna Newrozê hinek kes hene karê wan gelekî zêde dibe, ji bo wan mûsima mezin Newroz e. Yek ji wan kesan Dayika Sebah Sîno ye. Sebah li Dirbêsiyê terzî ye û cilûbergê jinan didirû.

Berî hatina Newrozê, bi dehan keç û jin berê xwe didin mala Dayîka Seba Sîno û kincên Kurdî didin dirûtin. Ev 13 sal in Sebah Sîno odeyeke mala xwe li bajarê Dirbêsiyê yê Rojavayê Kurdistanê kiriye cihê dirûtina cilûbergan, di meha Adarê de û berya cejna Newrozê karê wê zêde dibe, parçe cawên Kurdî tejî odeya wê ne...
Sebah dibêje, îsal modelên nû yên cilên Kurdî derketine. Sebah ku 18 sal in cilûbergên Kurdî didirû dibêje, pirsgirêkên wan nebûna elektirîk û buhabûna nirxê caw e.

Di rojên pêşiya newrozê de mala Sebah Sîno tejî parçe cawên kes, sor û zer in, her kesek modêl û rengên cuda dixwazin..
Kesên ku xwe ji bo Newrozê amade dikin, rengên cuda ji xwe re hildibêjirin. Yek ji wan Zêne El Birî ye, Zêne dibêje, rengê kesk di biharê de xweşik û şêrîn e, ji ber wê yekê wê ew reng ji bo Newroza îsal hilbijartiye.

Li Rojavayê Kurdistanê di



rojên Newrozê de piraniya xelkê û bi taybetî jin cilûbergên Kurdî li xwe dikin, zêdetir xelk di roja 21ê Adarê de derdikevin û beşdarî ahengên Newrozê dibin.

# Li Rihayê kuçe û kolan ji heriya lehiyê tên paqijkirin

Taxên ku lêhiyê bandora xwe lê nîşan daye malên welatiyên din ava lîm û heriyê de mane. Welatî gilî gazindan ji kêmbûna hawarçûn û alîkariyan dikin.

Di lêhiya ku li bajarên Bakurê Kurdistanê rabûyî de bi giştî 14 kesan canê xwe ji dest dan û 5 kes jî winda bûne. Xebatên lêgerîna kesên winda berdewam dikin.
Taxên ku lêhiyê bandora xwe lê nîşan daye malên welatiyên din ava lîm û heriyê de mane. Welatî gilî gazindan ji kêmbûna hawarçûn û alîkariyan dikin.

Li taxên Akabe û Silêmanî yên Rihayê bi sedan mal û kargeh di bin av, lîm û heriya lêhiyê de mane. Ji aliyêkê ve saziyên hawarçûnê yên fermî ji aliyê din ve welatî bi derfetên xwe hewil didin kuçe, kolan û malên xwe paqij bikin. Welatiyên ku dema lêhî rabû de bi derfetên xwe derketin serbanan êdî nekarîn li malên xwe vegerin; lewra hemû kelûpelên malên qeta yek û diduyan di bin avê û lîmê de man.

Welatiyekî ji K24ê re ragihand: "Otomobîla min çû, mala min çû, tiştek nema. 6 zarokên min di avahî de man, min derfetên xwe em derketin. Min bi xwe du term ji kuçeya din derxistin. Wekî din jî gelek kesên mirî hebûn. Dûv re dewlet hat. Ji Dîlokê şaredarî hat, şaredariya vêderê nehat."
Ji aliyekê ve jî tîmên fermî li nava kûçe û kolanan belav bûne û derbarê zirar û



ziyanên lêhiyê de raporan tomar dikin. Welatî ji rewşa piştî lêhiyê gilî û gazindan dikin û dibêjin; pêşiya avê vekiribûya dê av di kûçeyan de netengijiya û malên wan jî di bin lêhiyê de nediman.

Welatiyê bi navê Salih Beg jî diyar kir: "Mala me li vê derê bû, em ketin hûndir û ev e hûn halê me dîbînin. Mala me di bin avê de ma, ev e her tişt li ber çavan e. Tiştek nema. Ya mihûm can û xema mal nake; em bi derfetên xwe derketin."

Li taxa Akabe ya li navenda Rihayê, li derdor bi dehan otomobîlên ku di bin lîm û heriyê de mane hene. Li cihê bûyerê, av çar metreyan bilind bû. Qatên yek û di bin avê de man. Xebatên paqijkirina malan dest pê kirine. Mal û avahî êdî nikarin werin bikaranîn.

# Embareke kartolan hilweşiya; herî kêm 14 kesan canê xwe ji dest dan

Li Hindistanê ji ber hilweşîna banê embareke kartolan herî kêm 14 kesan canê xwe ji dest dan û bi dehan kes jî birîndar bûn. Li gorî medyaya Hindistanê, hilweşîna banê embarê ji ber wê bûye ku hejmareke zêde ya telîsên kartolan li ser bûye.

Bûyer li Herêma Uttar Pradesh a bakurê Hindistanê qewimî. Wêne û dîmen nîşan didin ku tîmên lêgerîn û rizgarkirinê li kesên di bin embara hilweşiyayî ya kartolan mane de digerin. Polîsên herêmê diyar kirin ku embar berî sê mehan bêyî destûr hatiye çêkirin.

Her wiha polîsan diyar kir ku stûnên embarê li ber barê giran ê telîsên kartolan nikarbû li ser pêyan bimînin. Rayedaran diyar kirin ku 4 birîndaran li nexweşxaneyê tên dermankirin û 6 kes birîndar jî hatine vegerandin bo malên xwe.

Alîkarê Mufetîşê Giştî yê Polîsan Şalab Matur diyar kir ku lêgerîna kesên sax berdewam dike û gihîştiye qonaxa dawî. Şalab Matur diyar kir ku bûyer bi dema Hewlêrê di demjimêr 08:30an de qewimiye.

Serokwezîrê Herêma Uttar Pradesh Yogi Adityanath serdana birîndarên li nexweşxaneyê kir û got ku kesên ku mexdûr bûne dê werin qerebûkirin.

Li gorî Berdevkê Serokwezîr, dê ew 2 hezar û 500 dolaran bidine malbatên kesên ku canê xwe ji dest dane û birîndar jî dê 600 dolaran werbigirin.



# Lihevkkirina di navbera Erebistan û Îranê de formalîte ye



N: Hesen Mukerem

Di heyama çend rojên derbasbûyî de rejîma Îran û dewleta Erebistanê bi navbendçîtiya Çînê lihev kirin da ku ji nû ve balyozxaneyên xwe di welatên hevdu de vebikin, piştî hin bûyerên ku li herêmê û cîhanê de li asta aborî û siyasî yên welatan de, ev lihevkirina formalîte pêk hat.

Çima dibêjim formalîte, ji ber ku ev şerê di navbera Îran û Erebistanê de ne şerê nîşan dana hêz an bidestveanîna xakê ye, belkû tenê şerê îdolojîkî ye.

Di sala 2016`an de destûpêwendiyên Spaha Pasdaran êrîş birin ser balyoxaneya Erebistanê li Tehranê û agir berdanê û hêzên ewlehî yên Îranê jî ti astengiyek ji bo wan çê nekir.

Muhsên Kazmînî Fermanderê Spaha Mihemed Resûlila Tehranê, ku sala 2016 an berpirsê ewlekariya Tehranê bû, gotibû ez bawer im ku, agir berdana balyozxaneya Erebistanê li Tehranê, karê hêzên bawermend yên Hizbulahê ye, di nava sîstema rejîma Îranê de bi her hinceteké û her dema bixwazin êrîşê bikin ser balyozxana welatekê, tê gotin ev êrîş ji aliyê Hizbulahiyan, yan fîdayan, an peyrewên hêla Xumeynî ve hatiye encam dan, ev ji di demekê de ye ku hemî ev êrîşên han bi erêya rejîmê bixwe tên kirin.

Êrîş bo ser balyozxanên welatan berdewam li Îranê de hebûye, êrîş bo ser Balyozxana Amerîka ku bû sedemê qutbûna peywendiya dîplomatîke di navbera herduk welatan di heyamê pitir ji 40 saliye.


Erîş bo ser balyozxana Birîtaniya, Êrîş bo ser Balyozxana Azerbaycanê, Êrîş bo ser balyozxana Erebistanê.

Rejîma Îranê bo vê ku bikare hem pêgeha xwe di nav welatên herêmê de zêde bike û hem jî desthilata xwe berfireh bike, di heyama desthilatdariya xwe de hewl daye, li welatên weke Hindûstan, Îraq, Lubnan, Azerbaycan, Efxanistan, Yemen, Behryên, Sûriye, Pakistan û hin welatên Afirqayê de, girûp an hizbên girêdayî bi xwe çê kirine û bi hemû aliyî ve piştewaniya wan dike, û çek û teqemeniyan bigire heta bigihîje bi warê aborî ve alîkariya wan dike.

Ji ber ku Erebistan jî welateke sunî meseb e û herwisa navenda oliî û ziyareta hemî mislmanên cîhanê ye, ji ber vê yekê jî Îran ti carî nikare digel Erebitanê rêk bikeve û rikeberiya îdolojîk û şerê Sune û Şî’e bûnê di gel de dike.

Ji aliyek din ve jî, eger ew lihevkirina pir girîng ba niha welatên bihêz yên weke Amerîka û Yekîtiya Ewropa jî ku baş Îranê nas dikin, îzina pêkhatina vê lihevkirinê nedidan û bêdeng nedibûn, her çawan ku di sala 2019`an de welatên Ewropaî sîstema INTEXê ji bo parastina sermayeya kompaniyayên xwe yên bazirganî yên li Îranê li hember tehrîmên Amerîka de avakir, lê, Nasir Ken`ianî Berdevkê Wezareta Karê Derve yê Îranê îtraf bi vê yekê kir û got, welatên Ewropayî li derheq soz û qewlên ku bona çalakkirina sîstema INTEXê dabûn ti pêngaveke hewce nehavêtine, wan welatan di tevahiya dema xebata INSTEX de ti çavkaniyên darayî û hêlên hitbarê yên demdirêj nexistine vê kanalê de.

Li derheq hevkirina di navbera Îran û Erebistanê de, “Şahzade Feysel Bin Ferhan, Wezîrê Karê Derve yê Erebistanê, di hevpeyvîn digel Nûçegihaniya Şerq El_Weset



de got: Lihevkirina Erebistan û Îranê bi wateya gihîştin bi rêçareyekê bona çareserkirina tev arîşeyên bijartî yên di navbera her du aliyan de nine.

Ev gotina wî tê vê wateyê ku ev lihevkirina han hitbareke wisa tune ye.

Di vê navberê de Çîn jî bi vê naybençîtiya xwe hem dixwaze hejmoniya xwe li ser Rojhilata Navîn de nîşan bide û hemî jî dixwaze bêje Amerîkayê ku, her tenê tu bi hêz û xwediyê pêgehekî qahîm li nawçê de ninî ez jî he me.

Dibe Erebistan jî ku ev çendîn sal in ji Amerîkayê daxwaza po`ana damezirandina Wizeya etomî ya aştiyane dike û Amerîkayê jî heta niha wek hevpeymanekê ti pêngavek nehavêtiye, dixwaze bêje ku eger alîkarî nekî hene ku alîkarî bidin, û meseleyek din jî heye ku dibe Erebistan ji ber qehrî bûn li Amerîkayê navbendçtiya Çînê qebûl kiribe, ev jî ji ber vê ku, Donald Tramp serkomarê berê yê Amerîka, Erebistan weke çêleka şîr danê ji Amerîkayê re binav kiribû.

Ya Îranê jî, ji ber ku di vê heyamê de, Amerîka û welatên Ewropayê berdewam navend û berpirsên sereke yên Îranê tehrîm dikin û berdewam girûp û milîşên girêdayî bi Îranê yên li Yemen, Sûriye, Behrêyn û Îraqê dikin armanc û li ser avên Kendavê dest bi ser gemiyên hilgirê çek û teqemenyên ku Îran bo Husyan dişanîne, girtin û Îran ji bo evê ku pêşî ji wan ziraran bigire û hinek jî demê bidest bixe da ku kêmkê givaşan li ser xwe kêm bike, amadebû vê lihevkirinê pêk bîne.

Di dawiyê de ev lihevkirina ti rehendek siyasî, lojîk, abûrî û ewlehiyê ji xwe nagire û tenê pêşîgirtin ji egera rû dana şerê cibiheyî di navbera Erebistan û Îranê de ye, dema ku wiha ye ev lihevkirina ewqas dewamî tuna be û girîng jî nine.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Arvîn Nîkipey dubare bo girtîgeha îdareya îtla`ata Merîwanê hat veguhastin

“Arvîn Nîkipey” welatiyê gundê “Nêy” yê girêdayî bajarê Merîwanê, piştî veguhestina rojekê bo girtîgeha vî bajarî, dubare bo girtîgeha Îdareya Îtila`atê hat veguhastin.

Pêka çavkaniya haydar “Kurdpa” yê, ev welatiyê han piştî ku bo girtîgeha Îtila`ata Merîwanê hatiye veguhastin, pêwendiyeke telefonî bi malbata xwe re nekiriye û ti zanyariyek derbarê çarenivîsa wî de nine.

“Nîkipey” roja Yekşemî 21`ê Reşemiyê ji girtîgeha îtla`ata Merîwanê bo girtîgeha vî bajarî hatibû veguhastin.

Ev welatiyê han di dema binçavkirinê de ji mafê hebûna parêzer û hevdîtina bi malbata xwe re bê par bû.

Roja Sêşemî 11`ê Rêbendanê, “Arvîn Nîkipey” bi bê nîşandan belgeya yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û ji bo lêpirsînê bo girtîgeha Îdareya Îtila`ata vî bajarî ve hatibû guhastin.

Piştî binçavkirina vî xortî, hêzên ewlehiyê êvariya roja Şemiyê 11`ê Rêbendanê, avêtine ser mala wî li gundê “Nêy” û dest danîne ser laptop û telefona wî û bi xwe re birin.

## Kurdpa; Îdamkirina serweyî yasayî ya Mihyedîn Îbrahîmî û windakirina bi zorê ya termê wî şermezar dike

Roja Înê berwarê 26’ê Reşemeya 1401’an, girtiyê siyasî yê Kurd yê bi navê “Mihyedîn Îbrahîmî” li girtîgeha Urmiyê de hat bidarvekirin. Komara Îslamî termê wî radestî malbata wî nekir û termê “Îbrahîmî” li cihekî nediyar de bi axê spartiye.

“Kurdpa” tevî şermezarkirina binçavkirina beredayî, proseya dadgehkirina nedadmend û nehiştina mafê hebûna parêzer şermezar dike, nemaze di qonaxên binçavkirin û lêpirsînê de di bin îşkenceyê de li girtîgehên ewlehiyê de, îdamkirina wî ya derveyî yasayê û windakirina bi zorê ya termê wî girtiyê jî şermezar dike.

“Kurdpa” radigihîne ku, îdamkirina girtiyên siyasî yên Kurd ku rêjeya bilind a îdamên ku ji aliyê Komara Îslamî ve tên encamdan, hertim weke taktîkeke siyasî li dijî gelê Kurd li Kurdistanê hatiye bikaranîn û ev yek jî bûye sedema hesabkirina gelê Kurd weke kêmnetewe ye, bi zilma zêde li ser wan bedelên kêmtir ji bo Komara Îslamî heye.

Pêka vê yekê “Kurdpa”yê, weke saziyeke mafên mirovan a Kurd daxwaz dike ku çavdêriya saziyên mafên mirovan û navdewletî yên li ser kiryarên Komara Îslamî ya Îranê li dijî girtiyên siyasî û birêvebirina cezayên îdamkirinê li dijî wan bê zêdekirin û divê Komara Îslamî li hemberî pêvajoya bê sînûr ya îdamkirinê, darizandinên neadil û kiryarên tûndûtîjiyêde bersivdar be.

Ji aliyeke din ve jî, windakirina bi zorê ya termê girtiyên siyasî bernameya tepeserkirina rejîmê ya dijî dijberên siyasî û gelê Kurdistanê ye û Komara Îslamî vê weke amûra fetisandin û tirsê bi kar tîne û êş û azaran li ser malbatan de dide sepandin.

Li gorî ku ji sala 2012’an şûnda ji koma 31 girtiyên siyasî termên 21 kesan radestî malbatan nehatine kirin û cihê biax spartina wan jî nayê zanîn.

Kiryarên wiha yên tepeserkirinê armanckirî ya Komara Îslamî li dijî dijberên siyasî yên Kurd bi tundî ji aliyê Kurdpa ve tê şermezarkirin û îşare bi vê yekê dike ku hewce ye mîkanîzmeke cidî ji bo berpirsyar girtina Komara Îslamî û bidawîanîna vê kiryara tirsinak bê şopandin.

## Îdamkirina herî kêm 4 girtiyan li girtîgeha Navendî ya Urmiyê

Sibeha roja Înê 26’ê Adarê, 4 girtiyên Kurd bi îdamê hatin cezarkirin navên wiha ne: “Cehanbexş Radlûyî” kurê Sêvdîn xelkê gundê “Axçeqel” a ser bi navçeya Somayê, “Mihemed Eyûbiyan” kurê Mihemedsalih xelkê gundê “Mavana” ya ser bi navçeya Tirgewer, Froher Ebasnjad û kurê Reşîd û xelkê gundê Gocar a ser bi navçeya Tirgewer û Yasîn Reşîdî û kurê Erdelan û xelkê gundê Kelhera ser bi navçeya Tirgewer, li girtîgeha Navendî ya Urmiyê hatin îdamkirin.

Ev çar girtî roja Çarşemî berwar 24`ê Reşemeyê ji bo cîbicîkirina biryara îdamê bo huodeya takekesî ya girtîgeha Urmiyê hatibûn veguhestin.

Ev 4 girtî berê bi tohmeta “kirîn û firotina” madeyên hişber hatibûn binçavkirin û piştre ji aliyê Dezgeha Dadweriyê ve cezayê îdamê li wan hatibû birîn.

Heta niha nûçeya îdamkirina wan 4 girtiyan ji aliyê navendên fermî û medyayên navxweyê Îranê ve nehatiye ragihandin.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (442)




## Bila newroza şoreşa Jînayê, bibe remiza berxwedana şoreşa dijî dîktatoriyê